# azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ



*ji azadî û serxwebûnê birûmettir tiştek nîn e. ( Ho Chi Minh )*

hejmar 4 kanûn 1978

# ÎRAN: BERBİ DAWÎYA

Iran seranser dikele.Ji Kurdistanê heta Belûcîstanê, ji Abadanê ta bigre Tebrîzê gelên Iranê bihevre liber hikmê Şah,yek ji mêrkujtir û zorkartirên Sedsala bîsta,radibin.Tac û text û saltanata Şah dihejin.Ne SAVAK,ne CIA,ne Carter,ne leşkerên bi milyar dollaran,bi delalî xwedî kirîn ji heqê vê lehîya gelerî nayên der, nikarin bi kuştin û çavtirsandinê kela xelkê bidin danîn.Zorkar û pêgirtîyên wî îndî demên xwe yên dawîn dijîn.Pirsa girîng ev e:Piştî Şah Iraneke çawa?..

Şerê domdirêjê gelên Iranê jibo azadîyê û demokrasîyê, li dijî dîktatorî,zorkarî û emperyalîzma Amerîkanî digihê gehîneke nû,xurt û kifşker.Di vî şerî de heta niha bi hezaran kes jiyana xwe dan,bi deh hezaran di girtîgeh û zîndanên Şah de rizıyan.

Rehên dîrokî yên vê keftelefta dirêj dikişin heta salên şerê cîhanê yê diwemîn. Hingê gelên kurd û azerbeycanî ku hikmê zorkarê Riza Pehlewî diperçiqand azadîya xwe ya neteweyî bidest xistibûn û ji xwere komarên serbixwe sazkiribûn. Ingîlîz û AmerîkanîRiza Şahê ku dilxwazê Nazîyan bû,ji text danîn û kurê wî-Şahê niha-anîn şûna wî.Jibo têkûzkirina karîna vî Şahê ku wan jibo parastina kêrhayên xwe yên petrolî,ahorî û stratejîk anîbûn ser text,ewan leşkerê Iranê jinûve tenzîm kirin û di perçiqandina Komarên Mahabad û Azerbeycanê de arîkarîya wî kirin.

SERECEM


▶ Iraq: Dema derew û hovîtîyê................r. 4
▶ Ji Dîroka Kurdistanê.........................r. 6
▶ Kardûx û Welatê Kardûxan....................r. 8
▶ Jinên Kurd li Sovyetîstanê..................r. 9
▶ Kurd û Şoreşa Cotmeha 1917 a...............r.10
▶ Helbest: Mayakovskî, N. de Sousa...........r.11
▶ Daxuyanîya Partîya Kommunîst...............r.12
▶ Bingehên Destpêkîyên Felsefê...............r.14
▶ Enîya Xebatkaran.............................r.15
▶ Mirina Kamûran Bedir Xan....................r.16
▶ Zman,Ferhengok...............................r.18
▶ Nameyên Xwendevanan..........................r.20
▶ Deng û Alan..................................r.22
▶ Stran û Leylan...............................r.23
▶ Gilîyên Çeprazî..............................r.23

# KİRÊTA ZORKAR



— Divîyabû ku ez demokrasîyê xelaskim.

## Merivê CIA yê

Hê di destpêkê de Şah di ber çavê xelkê Iranê de "merivê Amerîkanîyan" û yê "Iran Petroleum Company" bû.Kesî ewî di dilê xwe de neheband û di her fersendê de xelkên Iranê jibo welgerandina wî serî hilanîn.Di sala 1952 an de li ser daxwaza xelkê Enîya Millî ya Dr. Mosadeq nefta Iranê ji destên biyanîyan stend û xwast karîn û nifûza Şah kêm bike.Di helbijartinên 3ê tebax 1953an de hatine çêkirin gelên Iranê bi piranîyeke giran li dijî Şah deng dan.Li Mahabadê tenê 2 deng derketibûn jibo Şah.

Piştî vê yekê Şah ji tirsa revîya çû Romayê.Piştre CIA li Tehranê komplokî mezin çêkir, hikûmeta Mosadeq qeliband û Şah ji nûvê anî ser hikim(3.8.1953)

Ji wê rojê de Iran di nav şerê hindurî yê neîlankirî de dijî.Jibo şkênandina berxwedana xelkê Şah bi mîlyar dollaran pere serf kir,ordîyeke mezin û Savakê saz kir û hebûna xwe sipart van her du hêzên zorkarîyê û paraskerên xwe yên Amerîkanî.40 000 leşker,mihendîs,teknîsyen û pisporên Amerîkanî,bi sedan pisporên Istixbarata Israîlî "Mosad" ê di tenzîm û meşandina van her du stûnê li ser kîjanan rejîma Şah jibo Ordîya xwe 10 milyar dollar (260 milyar Lirayê Tirkî ) serf kir.

Savak bi kuştin û tada karibû hin hêzên siyasîyên pêşverû wekî Partîya Tudeh qels bike,lê nikaribû daxwaza bi mîlyonan Iranîyan bifetisîne. Gelên Iranê di 1963 an de serî hilanîn û ev serhilanîn bi heftan dom kir.Leşker û Savak bi kuştina nêzikî deh hezar kesan vê lehîya şoreşgerî jibo demekî rawestandin.Va ye ku daxwaza azadî û demokrasîyê ji nûve ,wekî agirekî ku di bin xwelîyê de mabe lê venemirîbe,geş dibe pêtî dide.

(dûmahîk heye)

**bimre şahê zorkar**

**dijminê yekayê gelên îranê!**

# İRAQ: DEMA DEREW Û HOVÎTÎYÊ

Gelê Kurdê Îraqê îro demekî dijwartir û tarîtir ê dîroka xwe dijî.Bidardakirinên bêmahkeme û bêhejmar,sirgûn û şarederî,valakirin û xerakirina gundan,şewitandina bax,baxçe û zevîyan,dicih de kuştina pez û dewaran,rêza bêdadî û cirmên ku rejîma zorkera Baasî li karker û gundiyên Kurd dike dûr û dirêj e.Jiber kêmasiya çûnehat û agahdariyan vê rewşa girînga Kurda qenc nayê naskirin."Partî" û grûbên sîyasî yên Kurdîstana Iraqê ji şerê hevûdin kirin û pevçûnên hindûrî pêre nagîhên di warê agahdariyê de tiştek bikin.Me ji rêwîyan û ji Kurdên Iraqê hin nûçe berevkirn û ewan,bikurtî,li jêrê derdixin.

Li gora gotarên resmiyên karbidestên Baxdayê Kurdîstana Iraqê"navçeyeke xweser" e,hemî mafên Kurdan hatine naskirin.Kurd û Ereb li Iraqê wekhev in.Rejîma baasî vê propogandayê ne tenê li hindur lê wisa jî bi serfkirina perekî mezin li derve jî dide kirin û dixwaze rûçikekî"pêşverûtî","çepîtî","şoreşgerî",heta"sosyalîstî" bide xwe.Xwezaya paşverû û kevneperesta hin partiyên Kurdên bi Iran, CIA an Sûrîye ve girêdayî bikêrî vê propogandayê tê û Baas hemî Şerên dijî perçiqandina gelê kurd,jibo maf û azadiyên mirovî yên himî,jibo rizgariya neteweyî wekî "komployên emperyalîzmê"li dijî "Şoreşa Iraqê"nîşan dide.

Lê,di piştxêliya"pêşverûtî" û "şoreşgerî" de rejîma dîktatorîya Bexdayê li gelê Kurd stem û zorkariyeke di dîroka Iraqê de nedîtî dike.

## bi deh hezaran şarederkirî

Di adara 1975 an de,piştî lihevhatina Cezayîrê di navbeyna Iran û Iraqê de serokatiya PDK a Iraqê Pêşmergan di cih de hiştibû û revîya bû Iranê.Hêzên Kurdên bêserî mayî jihev belav bûbûn û şerê berxwedanê pelişî bû. Hindê qasî 300 000 Kurdên Iraqê derbasî Iranê bûbûn û lîwêdere wekî torketî di kampan de dijîn.Bexda wa'd dabû ku heke ew vegerin Iraqê ewê bên bexişandinê.

Piraniya wan vegeriyan,lê hikûmeta Iraqî gotina xwe bicih nanî û ewan tevî hin gundîyên Kurdên din koçemalî şand çolên nîvroyê Iraqê,navçeyên Dîwaniye û Nasiriyê,dako ew jibo"cerima cirmen xwe beriya ereb hêşîn bikin."Nêzîkî çar sal bi şûnda hê 150 000 Kurd li van berîyan wek dîl û koleyan dijîn.Ew li nav gundên Ereban hatine belav kirin dako zmanê xwe jibîr kin û bibin Ereb. Ew nikarin jibo dîtina merîvên xwe be jî vegerin gund û bajarên xwe yên Kurdîstanê.Heta jibo çûna Baxdayê wan divê destûra Istixbarata îraqî bistînin jibo 24 an 48 saetan. Heta roja îroîn karbidestên Bexdayê rê nedane ku rojnamevan an nêrevanên biyanî herin rewşa van 150.000 hezara dîlên Kurd dicîh de bibînin.

Van mehên dawîn, dîktatoriya baasî dest bi pêkanîna pîlaneke stemkar û xwînxwar a nû kiriye. Ew dixwaze sê milyon Kurdên Iraqê ji brayên wan ên Kurdîstana Tirkiyê,Iranê û Sûriyê veqetîne.Jivê bûnê li navçeyên dora tixûban,ewdike şirîtekî erdê ji rûniştevanan xalîkirî,rengekî"no man's land" pêk bîne. Ewê firehiya vê şerîta an"kembera parastinê" 20 km be.

Ji niha ve gundên aliyê Berwarê hatine vala kirin.Kamyonên eskerî bi darê zorê gundiyan,çi jin çi mêr çi zaro,çi kal çi pîr,hemîyan bar dikin û ber bi bajar an deş tên din dibin.Dûrê terş û dewarên wan di civînîn û di cih de di kujin.Pêşîyê gund tevî mizgeftê û avahiyên din dişevitînin û Bull dozer ciyê gundî rast dike.

Helîkopter ji jor de asîdê direşînin û hemî dar û beran di cih de hişk dikin,dişewitînin.Leşkerên dîktatoriya faşîzana Bexda yê heta kaniyên gund jî bi betonê diritimînin ku tu bermayê jiyanê li wir nemîne û ku cardin kes neyê li wan deran bicih nebin. Bi salixdanên ku gihîş tine me,ji niha ve bêtirî milyonekî dar û ber li navçeya Berwarê bi vî awayî hatine hişk kirin û şewitandin,bi deh hezaran gun dî ji gundê xwe qewitandinê.Ev hovîtiya şa yesteyî Hulagû û Hîtler niha ji li nêzîkî tixûbê Kurdîstana Iranê li navçeya Penciwînê xwe diyar dike.Û ne Carter ê şampiyanê"parastina mafên mîrovî"û ne "hêzên demokirat û aşîtîxwaz" li dijî vê hovîtiyê dengê xwe bilind nakin.Hov û mêr kujên Bexdayê di nav vê bêdengiya giştî da doma perçiqandina gelê Kurd dikin.

belengaz ku nikarin vî perê giran bidin neman mirîyên xwe bistînin û veşêrin.Û canîyên Bexdayê van kuştiyên "fidya"wan nehatiye dayîn şewitandin.

Van demên dawîn hikûmeta Iraqî îndî bi pera be jî cendekên kuştiyan venagerînemalbatawan û ewan li gorîstaneke nêzîkî Mûsûlê vedişêre.Di vê goristana ku jê re navê "Meqberetul Mucrimîn daniye di pênc mehan de 488Kurd hatine veşartinê.

Heta niha Hesabê giştiyê van cirmên rijîma Baasî nehatine kirin û kuştiyên Kurd ne hatine hejmartin. Lê hawirên agahdar bawer in ku di sê salên dawîn de ji du hezarî bêtir bi vî rengî xwînxwarî hatine kuştin.

Bêgoman di vê rewşê de qala"otonomiyê kirin bêmana ye.Hê di destpêkê de Fakulta Ziman û Edebiyata Kurdîya Bexdayê hatibû girtin.Akademiya Kurdî hate pelişandin.Di xwendegehên Behdinan de îndî Kurdî nadin xwendin.Heçî Meclîsa otonom û lîcna otonom ew karîkaturekî vala bêtir tiştek nîn nin; çend Kurdên dewlok,dûr û hevkarê dîktatoriya Baasî bilî dike,hestiye ke jibo kotina wan,ji gelê Kurd re kuştin, şewitandin,talan û şarederî ye.

## kuştiyen zîndana mûsûlê

Ji nîsana 1975 a bi vir de bi sedan Kurd hatin bidardakirn,gulekirin,kuştin Hin jibo arîkariya pêşmerga kirinê, hin jibo ku nan dane pêşmergan û wan li mala xwe hewandine an di mala wan de yekî pêşmerga heye. Pirî car ev "sûcdar" bê mahkeme û bê pirs tên kuştinê.Carna jî wan jibo usûlê be jî çend mehan davêjin girtîgehê.Dûre dibin zorê de pelên sipiyên vala bi wan didin îmzakirin.Paşiye polîs wan pelan bi "sûcên" wan dadigre û "mehkema şoreşgerî"ewan liser hîme van "sûcên ku wan lixwe danîye" mahkûmê bidardakirinê dike.

Mehên girtîgehê bi xwe ezabekî mezin in Girtî di menzel u mokên teng û tarî de di ser dilê hev de ne. Gelek caran ji kêmasiya oksîjenê hin kes difetisin.

Piraniya kuştiyan hê xortên 15-16 salî ne.Jibo xwînrêjên hovên Baasî divê ku "serê têjikê mara di cih de bên perçiqandinê." Bi vî awayî di meha gulana îsalî de 62 xortên Kurd bi hovîti yeke nedîtî hatin kuştinê.Dûre jibo ku cendekê wan vegerîne dê û bavên wan, karbidestên îraqî serê kesê 50 dînar(180 Dolar US) pere doz kir.Yên pir

Ewê gelê Kurdê Iraqê tenê bişerekî mêrxwas,şoreşger dibin serokîtîyeke şoreşger dikaribe destên mêrkuj û hovên Bexdayê bide rawestin. ■■■

**biji sere rizgariya gele Kurd li Iraqe**

**bimre karîna zorkara baas!**

# JÎ DÎROKA
# -III-

Di sedsalên IX-VII ê berî dewrana me li ser peravên gola Wanê dewletekî xurt saz di be ku Asûrî wê bi navê Ûrartû nas dikin.Lê ew bi xwe ji xwe re Xaldî (bi yunanî Xaldoy,bi Ibranî Ararat) dibêjin.Serbajarê wan nêzîkî Xelatê (Axlatê) bû.Hukumdarê wanê pêşîn Sardûr I e.Di sedsala VIII an de,Argistî I û Sardûr III tixûbên dewleta xwe fireh dikin, Azerbeycanê,Sûriya bakûr û hin kerî ji Asûr û ji dewleta Hîtîtên Anadolê zevt dikin.Lê di sala 743 an de Asûrî şerê Sardûr III dikin û biser wî dikevin.Dûrê îstîlayên Îskîtan bermayeyên dewleta Ûrartû hildiweşînin.Lê çend sal şûnde ewê qebîlekî Kurdê din,Med, wekî lehiyekî ji Medyayê (Kurdistana Iranê) bikişên,Imparatoriya Asûrî jibinî rakin(612 sal berî dewrana me) û qasê sedsalekî bibin mezintirîn û xurttirîn Imparatoriya Rohilata Nêzîk.

Med,di dîroka gelê Kurd de xwediyê ciyekî berbiçav in.Ji bo hin dîroknvîsên Kurd dîroka Kurda di sala 612 ê berî dewrana me,bi ketina Ninivê , serbajarê Asûrê destpêdike. Lewra me divê bêtir liser dîrok û şehrezayiya Medan bimînin.Lê berî ku em derbasî Medan,bibin du giliyên din liserÛrartûyan:Him ji aliyê zman u him ji aliyê dîn û pîşe ve,Ûrartû gellek nêzîkî Xûrîyane.Di xwedangeha (Panteona) wan de xwedayê mestir Haldî bû ku ew xwedayê wanê netewî bû.Dûre Teşeba (xwedayê Bayê) û Ardînî (xwedayê ar-agir û rojê) hebû ku her dû xwedayên dawîn li nik Xûriyan jî hebûn.Pîşe û şehrezayiya Ûrartûya li gora dema xwe gellek pêşveçûyî û geş bû;xasme karê hesîn û metalan.

## ÎMPARATORİYA MEDAN

Bi zmanê xwe,bi awayê jiyanê û hevdesaziya (organîzasyona) civakî Med ji hemî qebîle ûgelkokên pêşiyên Kurdan," pêşiyên nêzîktir" tên hesibandinê.

Agahdariyên li ser dîroka wan cara pêşîn di nvîsarên dema Salmanazar III,qralê Asûrê(859-824 berî d.m.)tên dîtin.Salmanazar III,dibêje ku di sala 834 ê berî d.m.,leşkerên wî ketine navçeya nîvro-rohelata gola Urmiye (Kurdistana Iranê) , welatê Medan.

Li gora dîroknasên ewrûpayî, Med,wek qebîleyên hindû-ewrûpayiyên din ên ku hatine li Rûsya û Ewrûpayê bicîhbûne,ji bakûrê Hindistanê,ji aliyê çiyayê Hîndîkûşê hatine û di ser Qafkasyayê de gihîştine navdeşta Iranê,navçeya Urmiye û çiyayê Zaxrosê û li wan deran cîwar bûne,tevî xelkê "azîyanîk" ên kevnên vî welatî bûne, zman û şehrezayîya xwe hînî wan kirine û ew bixwe jîji wan pirr tiştan stendine.Med di destpêkê de koçerên siwarî bûne û pirranî bi xwedîkirina pez û dewaran bilî bûne.Di sedsala IX a berî d.m.de Asûrî dixwazin tixûbên xwe fireh bikin û dest bi şerê Medan dikin.Heta hingê eşîrên Med belawela bûn,tu dewletekî,hevdesaziyeke wan a merkezî nîn bû.

# KURDİSTANÊ...

Li hemberî talûka bindestbûnê û koletiyê eşîrên Med pêşiyê di Konfederasyonekî eşîran de dicivin û li dijî dijmin hêzên xwe dikin yek,şer û perçebûnên nava xwe sist dikin.Lê Asûrî çav dane dewlemendiyên Medyayê (welatê Meda),metal û kevirên birûmet,hesp,hwd. Heta ku,Asûr jibo şkênandina van Medên çiyayî û siwarî,mecbûr dimîne ku jibo cara pêşîn di dîroka xwe de,ordiyekî siwariyan rast dike.Êrîşên Asûriyan roj bi roj xurttir dibin û di dema Sargon II (722-705) navçeyên rojavayên Medyayê dikevin destê Asûriyan.Bindestî zehf li zora van çiyayiyên qure,mêrxas,azadîhiz diçe.Di milekî de serekên Medan bi dijminên Asûrê re jibo sazkirina peymanekî hevalbendiyê peywendî girêdidin,danûstanên xwe û braxweyên xweyên Xaldî (Urartû) xurt dikin, di milê din de jî di hindur de yekîtiya xwe xurttir dikin, di navçeyên azad ên Medyayê de hîmê dewleteke merkezî datînin ku dikaribin çêtir şerê Asûriyan bikin.Sargon II,yek ji mestir serekên Medan Dayakû û mahbata wî şarederî Hamayê (Sûriyê) dike.Bi awê dîroknasê yunanî yê navdar Herodot,ev Dayakû hîmdarê Xanedana Med,sazkerê yekîtiya gelê Med e û bajarê Ekbatanê (Hama-stanê), ku dûre bû serbajarê Medyayê, wî avakiriye.

Dîsa Herodot dinivîse:"Evîna azadiyê Medan kir Şerkarê çê. Wan bi mêrxasî şerê Asûriya kir,berî dîlitî û koledariyê dan û azad bûn."

Piştî çend dehsalên bindestiyê,di destpêka Sedsala VII ê berî d.m.,eşîr,mîranî û qebîleyên Med yekîtiya xwe çêdikin,dibin serokîtiya Xşatritî de dicivin. Vê yekîtiya xurt û fireh Asûrê ditirsîne.Qral Asarhaddon(681-669) li dijî qefa Med şer dike û jibo perçekirina yekîtiya wan dek û dolaban digerîne, çend serekên Medan wisa jî serekê Îskîta Partarua razî dike, dike hevalbendên xwe.Xşatritî piştî bîst û du salên şer û serfiraziyên carcarî tê kuştin û leşkerên wî li ber leşkerên Îskîtên hevalbendên Asûriya dişkê.Îcar Medya jibo bîst û heşt salan dikeve bin nîrê Îskîtan.Serekên Med ji van salên şer û bindestiyê ders distînin, hînî senetê şer û taktîkê leşkerî dibin û hêzên xwe liser bingehên nû sazdikin.

## DEMA KÎAKSAR

Di sala 625 ê berî d.m.,Kîaksar,gelê xwe ji bindestiyê rizgar dike û dest bi zevta dewletên dora xwe dike. Hingê li navçeya Parşumaşê,li quntarê jêrînên Zaxrosê mîraniyeke piçûka Farisa hebû;ew jî dikeve bin destê Kîaksar,ê ku hemû Iraniyan di bin serweriya xwe de dicivîne.

Armanca Kîaksar ji binî hilweşandina dewleta Asûrê bû.Lê ev dewleta zorkar hê gellek xurt bû.Ji hemberên wê yên berê Elam îndî ketibû,mabû Babîlon. Kîaksar li hemberî Asûrê bi Babîlonê re hevalbendî çêdike,keça xwe Amuhîd dide kurê Qralê Babîlonê.Hêzên Medan di sala 614 an de Asûrê,serbajarê nîvroyiyê Asûriyan distînin.Dûre leşkerên Babîlon û Medan digihên hev û Kîaksar di sala 612 an de dikeve Ninivê(serbajarê Asûrê),vê dewleta kevnareya 1400 salî radike,dixe dîrokê.

(dûmahîk heye)

# JÎ DÎROKA KURDÎSTANÊ ...

## KARDÛX *Û WELATÊ* KARDÛXAN

### AN KURD Û KURDISTAN DI WEXTÊ YEWNANÎSTANA KEVIN DE

Piştî mirina Daryuşê dawîn kurê wî ê mezin Erdeşîr li ser textê Ecemîstanê rûnişt.Birayê wî ê kiçik Korûş,kurê Perizadê,dilê xwe lê xira kirî bû.Erdeşîr pê hisiya,birayê xwe da girtin û kir ko wî bikuje.Lê Korûş,bi mehdervaniya diya xwe, canê xwe xelas kir.Erdeşîr di brayê xwe borî,ew bi xatirê Perîzadê da lê li cem xwe ne hişt.Erdeşîr Korûş kire waliyê Enedolê û ew ji cem xwe bi dûr xist.

Korûş li Enedolê jî rahet ne disekinî.Agirê seltenetê di dilê wî de venemirî bû.Ji ker ve xwe kar dikir.Esker dida hev.Ji Yewnanîstanê zabit û kumandar tanîn.Ji yewnanan di bin fermandariya Klêarx de jî deh hezarî bêtir peya gihandî bûn hev.

Korûş piştî ko karê xwe kir;bi ordîyeke mezin ajot ser birayê xwe.Erdeşêr pê hisiya bû û ewî jî xwe kar kiri bû. Di cihê ko îro jê re Xana Iskenderiyê dibêjin her dû bran li hev xist.Eskerê Korûş zora dijminê xwe birî bû,lê ji ber ko Korûş di şer de hatî bû kuştin,eskerên wî ên mizefer belav bûn û ji hev de ketin.

Ji eceman hinek derbasî aliyê din bûn; hinên din revîn û yewnan bi serê xwe man.

Eceman Klêarx û kumandarên din eziman din taştêyeke û bi hilekê ew kuştin.Ordîwa yewnanan di welatekî xerib de bêserî ma bû Şerê ecem dijminê wan hevalbendên wan ên kevin li wan qulipî bûn. Ne dizanin wê çi bikin.

Hin zabit û eqîlmend gihane hev û şewrek danîn.Di ordîwê de mirovekî hêja hebû,bi navê Ksênefon.

Ksênefon xortekî hêja û xwenda û mêrekî qenc bû.Di şewrê de herkes bi hêjabûna wî hesiya bû. Hevalên wî rabûn ew ji xwe re fermandar bijartin.

Ksênefon di heqê vê seferê de kîtabek bi navê"Enêvesîs" nivisandiye.Di vê kitêbê de Ksênefon biserhatiya wî leşkerî û sefera ecem dûr û dirêj qise dike.

Yewnanan dikir ko vegerin welatê xwe. Diviya bû di Diclê re derbas bibin.Dîcle rabûbû,pir lê nîn bûn; av ji bor ne dida. Eceman da bû pey û zor dida wan.

Yewnanan qedera xwe da:hindava xwe biguhêrînin,berê xwe bidin bakûr,ji welatê kardûxan derbas bibin ûtê re xwe bighînin Behra Reş.

Welatê kardûxan welatê me ye.Hingê ji kurdan re kardûx digotin.Gava em hingê dibêjin,divêt bête zanîn ko ev hingê ji me gelekî dûr e.Beriya Isa pêxember bi çarsed salî.Ji hingê heta îro li me kurdan 2380 sal borîne.Lê em di cihê xwe de ne.Me ber bi bakûr ajotiye; lê me xwe ji cihê xwe ê kevin ne daye paş.

Ksênefon di kitêba xwe da bi "ez"ê naştexile.Xwe wek welê gilî dike.Ji lewre gelek caran navê wî ji devê wî têt bihîstin.Êdî guhdariya Ksênefon bikin.

Eskerê Ksênefon xwe gihandi bû bilindcihan û raserî dijminan bû bû.

Eceman xwe dida û diketin rêke din. Xrîsof-kumandarekî yewnanî-bi eskerê xwe ve daketî bû deştê,eskerê xwe li gundên têrzad û zexere bi cih dikir.

(dûmahik heye)

**herekol azîzan**

*(x) Ev bend ji kovara "H A W A R" hejmar 32 hatiye stendin.*

# JİNÊN KURD Lİ SOVYETİSTANÊ



Dengbêja Kurd ZADINA ŞEKIR

Şoreşa Cotmeha (oktobira) Sosyalîstîya Mezin tevî azaya siyasî,sosyal,aborî û çandî,wisa jî azadîya rast da jinên Ûrisêtê,îzna wana weke ya mera nas kir.

Tevî gelên Imparatoriya Rusyayê wisa jî pareke gelê kurd,ku di navçeyên Pişkafkazê û li Asiya Navîn diman ji bindestîya milletîyê û sosyal aza bûn.

Di van salêd pey Cotmeha mezin,wekî gelêd bira gelê Kurd jî gihîşte destanînêd bilind,guhartinêd mezin ketine nava jiyan , rewş û deba wê.Jina Kurda ku berê tenê kevanî û bermalî bû,derkete meydana şerkarîyê,bi aktîvî kete nava şuxulê çêkirina jiyana nû.

Pey testîqbûna qeydî sovyetî ra,Komîteya Merkezîya Partîya Ermenîstanêye Kommunîstîyê û dewleta komarê guhdarîya mezin dane ser pirsêd pêşdaçûnîya gelê Kurd di her alî de.Hema sala 1921 ê seba lênihêrandina pirsêd hildana paşdamayintîyê û gumrehkirina xebata siyasî nava Kurda da, civîna Kurda ya pêşîn hate gazîkirinê,kîderê wisa jî pirsa rewşa jina kurd hate lênihêrandinê. Lê îdî di mijdara (novambira) wê salê de,li Hecî-Xelîlê Kongreya jinêd Kurda berev bû.Kongre hînkera (instruktora) para jina ya Komîteya Merkezîya Partîya Ermenîstanêye Kommunîstîyê Nûra Egît Polatovayê (xwişka şoreşgerî binavûdeng Fêrîk Polatbekov) derbaz dikir.Ev kongre di nava dîroka gelê Kurda da tiştekî nedîtî bû.Cara pêşîn jinêd Kurd berev bûbûn,wekî pirsêd halê xwe, riyên pêşketina xwe zelal bikin.

Nûrê Polatovayê hela hê berî testîqbûna qeydê Sovyetî bi germî tevî xebata mexlûqetîyê dibû. Dema şerê cîhanîyê pêşîn ewê kulfeta Kurd ji gund û bajaran sêwî berev dikirin û li sêwîxana cîwar dikirin.Lê meydana şuxulkarîyê ya rast seba wê pey testîqbûna qeydê Sovyetîyê ra vebû. Nûra Egît hema rojêd pêşînda li alîyê hikûmata Sovyetîyê sekinî.Ewê xebateke kêrhatî û giranbiha kir, wekî niyet û armancên hikûmatê bigihîjê xebatkarên Kurd,wekî jina Kurd bi aktîvî tevî xebata siyasî û mexlûqetî bibe.

9 ê tebaxê sala 1923 a bû civîna Kurdên Koçer.Di civînê de Nûra Egît bi gotareke derheqa pirsêd zewacê,malê,dibistanê û xwendinê de pêşda hat.Ew yek alî wê yekê kir,wekî nava Kurda da bi çapa mezin xebata hildana nexwendîtîyê pêşda çû.

(dûmahik heye)

**TOSINÊ REŞÎT**
Nvîskar û helbestvanê Kurd
**TÊMÛRÊ XELÎL**
Xebatkarê rojnama "Rîya Teze",

# KURD Û ŞOREŞA COTMEHA 1917 A

# BÎST SALÎYA XWE DE SEREKEKÎ LEŞKERÊ SOR BÛ LI SIBIRYAYÊ



Bona şoreşa Cotmehê serkeve bi hezar hezaran law û dotên Urisiyetê here baş serê xwe dan. Nava wan Prometeyên Sedsala bîstî da wisa jî lawên gelê Kurd hebûn, ji kîjana yek jî şoreşgerê binav û deng, komîserê gelerî ya Sibîrya merkezî, helbistvan, rojnamenvîs Ferîkê Egît Polatbekov bû ku ew wisa jî bi navê Fêodor Lîtkîn hatiye naskirinê.

Ferîk di sala 1897a, 2ê tebaxê li gundê Tûlûnê, qeza Îrkûtskê ji diya xwe bûye. Bavê wî Egîtê Polatbekov ji qeza Qersê gundê Xirave bi zorê sirgûnê Sibîryayê kiribûn, lê diya wî Anna Lûkyanovna Kartaşova rûniştevana cî bû. Ferîk zariyê malêyê mezin bû, pey wîra Nûrê, Marûsya û Baso bûn.

Di sala 1907 a da, Egît tevî jin û zarê xwe vedigere Qafkasyê, lê zûtirkê Anna nexweşdikeve. Baso li cem bavê dihêle, lê hersêkêdinê hildide û vedigere Tûlûnê.

Pey qedandina xwendegeha Tûlûnê ra Ferîk sala 1909 a li Gîmnazya (xwendegeha navîna) Îrkûtskê tê hildanê.

Li Ûrisiyeta Çaran de ji bona zaroyên ne Ûris ew jî ji malê belengazan, riya xwendinê girtî bû. Tenê zane bûn, marîfeta Fêrîkê bêhesab di lê mamoste nerm kir û mafê xwendinê dane wî.

Pey şoreşa sala 1905 a dewleta Rûsyayê bi hezaran şoreşvanan sirgûnê Sîbîryayê kiribû, bin hukmê kîjana bîr û bawerîyên şoreşgerî li wêdere gelekî bela bûbûn. Wan sala Fêrîk ber çavê xwe şoreşvanên bi qeyd û çidar dibîne, têr û tijêbûnên dewlemenda, birçî û tazîbûna belengazan dibîne û bi her awayî dixwaze ber siva vê cûdatîyê bibîne.

Wê demê li berevokê afirandinê xwendekarên Irkûtskê gelek bend û helbestên wî bi qolê Poloto Bêk derdikevin.

Lê çiqas diçe xebata siyasî ew qas wî berbi xwe dikşîne û zûtirkê tevî hevalekî xwe yê gîmnazyayê, Parnyakov, komela siyasî saz dike û di sala 1915 a kovara dizî bi sernivîsa "Xebata Me" çap dikin. Fêrîk berpirsîyarekî kovarê bû. Ew bi bîr û bawerîya xwe yê şoreşgerîyê va û xebata siyasî va tê naskirinê û hema havîna 1915 a jî wî ji gîmnazyayê derdixin.

Betlaneya (tatîla) xwe ya havînê li cem bavê xwe li Xirabê - Dîgorê derbas dikir. Bi heweskarîke mezin zargotin, çand û rabûn-rûniştandina gelê xwe re dibû nas, hizkirina wî berbi gelê wî li name, nivîsar û başqe helbestên wî yên vekirî "Eskanda" tê xuyanê.

Seva kutakirina xwendina xwe Fêrîk diçe Yênîseyskê.Vira ew bolşevîkên cîra dibe nas û zûtirkê dibe serokâ komela xwendekara yê siyâsî. Sala 1916 a îdî helbestên wî kovar û rojnameyên Sîbîryayê de çap dibin.Helbestên wî wisa jî bi be revoka beşqe li Irkûtske ronkayê dibînin.

Nûçeya welgerandina rejîma çar di ada ra 1917 a gihîşte Yênîseyskê.Bajêr de yekîtîya xwendekaran hat sazkirin, kîjanê biberpirsîyarîya Fêrîk dest bi çap kirina "Bin Ala Şoreşê " kir.

Havîna 1917 a Fêrîk cara paşîn tê Xiravê-Dîgorê.

Pey mirna dê re,ew her du xuşkên xwe tîne cem bavê xwe.Li wê ew û Baso pevgirêdana bolşevîkê Qersê re çê dikin û nav Kurda de xebata siyasî dikin.

Nava şoreşvanên Tomskê de, li unîversîtê de kîjanê pey vegeran dina Fêrîk tê hildanê, navê wî zû bela dibe. Li wê îndî gelek hay ji bend û helbestên wî yên siyasî hebûn. Çawa hogirê wî yên xebatê bîr tînin kîderê gotinê tûj pêwist bû, kîderê kar gellek dijwar bû Fêrîk dişandine wira.Zûtirkê ew dibe berpirsîyarê organa bolşevîkên Tomskê, rojnama "Karkerê Sîbîryayê".

Pey Şoreşa Cotmehê li Irkûtskê kongira sovyetên karker,gundî û leşkerên Sîbîryayê berev dibe.Fêrîk yek ji sê wekîlên Tomskê bû di vê kongirê de.Li vê kongirê ew tê bijartinê endamê seroketîya sovyeta Sîbîryayê,komîserê gelerîya Sovyetîyê seroketiya Sîbîryayê.Kongre wî dibjêre çawa gizîrê (delegê) kongra Sovyetîya Çara.

Zûtirkê li Sîbîryayê dest bi şerê hindur bû. Emperyalîsta kirin ku leşkerên çekoslovakî derxin dewleta soyetîyê.Fêrîk çawa berpirsîyarê rojnama "Krasnoar mêês" li pêşênîyê bû. Meha mijdara (Novembra) 1918 a nêzikî bajarê Olekmînskê li Yakûtîstanê Fêrîkê Egît tê kuştin.

Fêrîk tenê 21 sal jî; lê ev 21 sal bûne nimûna xebata geş,nimûna çavdayîn û mêrxasîyê.

**Tosinê Reşit**

## bikşin

Bikişin
proleter
jibo şerê dawîn!

Koleno
rastbikin
çokên xweyî tewandî!

Leşkerê proleter,
sef bi sef herne pêş!

Her bijî şoreş
a bi şahî û lez!

Ev
şerê ha
mestirîn û yekta
yê ji hemî şeran
ku ketine dîroka

**Mayakovski**

Helbestvanê Sovyetî
(1893-1930)

## Dengê Me

Dengê me,brako
Sîyar bû,wek bagera zanînê
Û pêtîyên ezabê vêdixe di çavên zer
Û çirûskên hêvîyê geş dike
Di giyanên tariyên bêhêvîyan de.
Dengê me,brako
Dengê me,tam-tam e,gazî dike.
Dengê me,hêvîya çarderojî yê di
Şeva bêhêvîyê
Dengê me,bi milyonan dengên hewarê!.
Dengê me,ji belangeziyê xurt e,
Dengê me,zincîran dişkêne
Dengê me,yê Afrîkayê
Dengê me,yê reşê ku qîrqir e diqîre
Dengê me,tam-tam e,gazî dike
Dengê me,brako
Dengê me,bi milyonan dengên
ku qîreqîr e
diqîrin
diqîrin.

**noemiya de sousa**

# Qunciké Marksîzmé

## DAXUYANÎYA



KARL MARX (1818-1883)

Wê ricifandinên pîrozên zikra dînî, kelûbîna şovalyeyî, pêgîmendahîya (hîssîtîya) bûrjûwaya piçûk di nav avên qeşayî yên hesabê xweperest de fetisand. Wê serbilindahîya (vakara) kesane rakir kir rûmeteka basîta danûstanê; di şûna azadîyên bêhejmarên gerew (garantî) kirî û çendî biha bidest xistî, wê azadîya yekta û bêdilovanîya têcirîyê danî. Bi gotinekî, li dewsa kedxurîya ku rewnayên (xeyalên) dînî û siyasî xêlî dikirin, wê kedxurîya vekirî, bêşerm, yek ser û stûr danî.

Bûrjûwazî hemî karên ku heta hingê bi qedrekî pîroz dihatin wek hebandinê, ji şana wan rûçikand. Hekîm, hakim, keşe, helbestvan, mirovê zanistiyê, wê ewan anî kir karkerên diravgîr.

Bûrjûwazî xêliya pêgîmendahîya (hissîtiya) dilsoja ku peywendiyên malbatî (ailewî) dinixamt çirand û wan daxist rûhêla (sewiya) peywendiyên basîtên diravî (pereyî).

Bûrjûwazî dîyar kir çawa raberiya hovdara xurtahiyê li Heyama Navîn, ku paşverûtî ew qas diheband, tevakerê xwe yê lêhat di nav zexeliya qirêjtir de didît. Wê, pêşîyê nîşan da karê mirovî bi çi dikare: wê ji pîramîdên Misrê, cihên Romayê, katedralên gotîk dertir harîka pêk anî; wê ji îstila û şerên xaçperstîcihêtir seferan bir serî.

Bûrjûwazî nikare hebe bêy ku timî di peywengên (aletên) hilberînîyê de, ango di tevahîya peywendîyên civakî de, şoreş bike. Dijane, di cîh de, bê guherandin hiştina awayê kevnê hilberînîyê jibo hemî Çînên sanayîkarên berê şertê yekayê hebûna wan bû. Ev welgerandina domkera hilberînîyê, ev hejandina bêsekna hemî şertên civakî, ev kelekel û bêewlehîya hertimî dema burjûwazîyê ji hemî heyamên berê cihê dike. Hemî peywendîyên civakîyên rûniştî û cemidî, tevî rêza wana averû û ramanên kevneşopî û pîrozî, dibişivin; peywendîyên ku nû hatine rastkirin berî ku dikaribin hestî bigirin, kevn dibin. Her unsûrê hiyerarşîya civakî û îstiqrara kastekî wekî dûyê namîne diçe, herê ku pîroz bû ji rûmetê dikeve û meriv dawîyane mecbûr in bi nêrîneki ronak li rewşa xweya civakî binêrin, peywendîyên navbeyna xwe bînin ber çavên xwe.

Bi tana hewcedarîya bazarên berebere fireh tir jibo hilberîyên xwe, bûrjûwazî hemî dinyayê îstila dike. Wê divê li her derî xwe bicîh bike, her tiştî bikar bîne, li her alî peywendîyan rastke.

Bikaranîna bazara cîhanî, bûrjûwazî rûçi-

# PARTÎYA KOMMUNÎST



F.ENGELS(1820-1895)

kekî kozmopolît [2] dide hilberînî û xeritandina hemî welatan. Çiqas paşverû herhikevin jî, wê sanayîyê ji hîma ne teweyî (mîllî) derxist. Sanayîyê neteweyîyên kevn hatine xera kirin û hêjî her roj tên xera kirin. Sanayîyên nû, rastkirina kîjanan dibe pirseka jîyan û mirinê jibo hemî neteweyên şehreza, dewsa wan digirin. Ev sanayî îndî tenê kaledendên (maddeyên xamên) cîgehî (mahallî) venaguhêrin lê wisa jî kaleden dên ji navçeyên dûrtirînên cîhanê hatî. Hilberîyên wan ne tenê li welatê wan bi xwe lê bi derbekî li hemî alîyên cîhanê tên xeritandin. Di şûna hewcedarîyên kevnên ku hilberînîya neteweyî tatmîn dikir, hewcedarîyên nû dizên, tatmîna wan hilberîyên diyar û îklîmên dûrtirîn doz dike. Di dewsa firekişahîya berê va navçeyan, di şûna neteweyên bixwe têraxweker, peywendîyên gerdûnî, hevgirêdayîya gerdûnîya neteweyan pêşve diçe. Û hilberînîyên hiş jî weka hilberînîya derdî (maddî) ye. Afirandinên bîrewerîyên neteweyekî dibin malê hevrayî va hemîyan. Tengîtî û tenê jiboxweyîya neteweyî roj bi roj bêîmkan dibin: ji pirrengîya wêjeyên (edebîyatên) neteweyî û cîgehî wêjeyeka gerdûnî dizê.

Bi saya zû edilandina peywengên (haletên) hilberînîyê, bi saya danûstanên bêhed hêsantir, bûrjûwazî heta neteweyên hovtirîn jî dikşîne nav herikandina şehrezahîyê. Erzanîya hilberîyên wê topa giran e ku dest didê hemî kel û sûrên Çînê hilweşîne û hovên bi serhişkahîya mezintir dijminê her biyanîyî mechûrê serîtewandinê dike. Ew zextê li ser hemî neteweyan dike ku ew raweyê bûrjûwayê hilberînîyê qebûl bikin; ew wan mechûr dike ku ew şehrezayî binav dike têxin nav welatên xwe, ango bibin neteweyên bûrjûwa. Bi gotinekî, ew ji xwe re dinyakî li gora benga xwe diafirîne.

Bûrjûwazî gunda kir bin bindestîya bajêr. Wê bajêrên qirase ava kir; wê bi awakî harîkayî gelhayê (nifûsê) bajaran li gora yê gundan zêde kir û wilo keriyek girîngê (mihîmê) xelkê ji kilekorî û gêjîya jiyana zevîyan qetand. Çawa wê gund kir bin destê bajêr, wê wisa jî welatên hov û nîv-hov kir girêdayîyên welatên pêşveçûyî û şehreza, gelên gundî kir dûajoyên gelên bûrjûwa, Rohelatê girêdayîyê Rojavayê.

(dûmahîk heye)

▲▲▲

---

*1. Kast: (ji casto "pak) çîna sosyal a girtî, bi kêrha û imtîyazên xwe ve girêdayî. Kast pêşiyê di civaka Hindistanê de hatine (nîşeya werger).*

*2. Kozmopolît: geliyekî yewnanî ye, ji kesê ku xwe endam û rûniştevanekî gerdûnê dizane û diare li hemî welatan bijî re tê gotin. Yê girîyayî, çeliqî, ji çanda gelek welatan tesîr stendî (nîşya werger).*

# BÎNGEHÊN DESTPÊKÎYÊN FELSEFÊ

**g. politzer**

Marx û Engels têkilî şerê nava nezanî û materyalîzmê bûn. Ew girîngîya servebûnîyên mezin ên sedsala XIX a têgihîştin (fehm kirin) û bi saya wan felsefa materyalîst di ronak kirina zanistîya gerdûnê de pêş veçûnên mezin kire. Bi vî awayî materyalîzma dîyalektîk za. Dûre, ew pêşîya hemîyan, tê gihîştin ku qanûnên xwezayê digerînin dest didin jibo îzaha meşa civakan; bi vî rengî ewan teorîya navdara mateyalîzma dîrokî pêk anîn.

Em pêşneyar dikin di vê pirtûkê de pêşî materyalîzmê, dûre materyalîzma diyalektîk û dawîyê materyalîzma dîrokî hîn bibin. Lê, berî hemî, em dixwazin peywandîyên nava materyalîzm û marksîzmê diyar kin.

## V. PEYWENDÎYÊN NAVA MATERYALÎZM Û MARKSÎZMÊ KÎJAN IN ?

Em dikarin ewan bi awayê jêrîn kurtîyar bikin:

1-Felsefa materyalîzmê hîmê marksîzmê ye.[1]

2-Ev felsefa materyalîst ku dixwaze îzaheke zanistî bîne ji pirsên cîhanê re, di domahîya Dîrokê de digel zanistîyan pêşve diçe. Wisa be, marksîzm ji zanistîyan derketî ve, li ser wan ava ve û bi wan re pêşve diçe.

3-Berî Marx û Engels pirî caran û di bin tesîrên cihê de, felsefeyên materyalîst peyda bûn. Lê di sedsala XIXa de, herwekî zanistî bi gavekî mezin çûn pêş, Marx û Engels, li ser bingehên zanistîyên nû jen, materyalîzma kevn nû kirin, materyalîzma diyalektîk danîn, kîjan hîmê marksîzmê ye.

Bi van çend îzahan em dibînin ku, li dijî vê ku tê gotin, felsefa materyalîzmê dîrokekê heye. Û ev dîrok bi nêzikî bi dîroka zanistîyan ve giredayî ve. Marksîzm li ser materyalîzmê avabûye, ji mêjîyê merivekî derneketî ve. Ew dawîneva, domahîya materyalîzma kevn e, kîjan hê li nik Dîderot[2] zehf pêşveçûyî bû. Marksîzm, geşbûniya materyalîzma ku Ansîklopedîstên[3] sedsala XVIII a pêşvebiribûn ya bi servebûnîyên mezin ên sedsala XIX a dewlemend kirî ve.

**( dûmahîk heye)**

*1- Binêre LENIN: "Le Matérialisme et la Philosophie du Réformisme" (Materyalîzm û Felsefa Reformîzmê), Karl Marx et sa doctrine, Editions Sociales, 1953, r. 60*

*2- DIDEROT Denis (1713-1784) nivîskar û fîlozofê materyalîstê fransiz. Ji 1747 a heta 1766 xebata mezina çêkirin û derxistina Ansîklopedîyê îdare kir. Pirtûkên felsefî û romanan jî nivîsîye.*

*3- Ansîklopedîst: Sazker û afirandkerên Ansîklopedî an Ferhenga hişanî ya zanistî, pîşe û zeneatan. Ansîklopedî di bin serokatiya Dîderot û d'Alembert, bi arîkarîya mezintirîn nivîskar û hîrewerên fransizên sesala XVIII a (Voltaire, Montesquieu, Rousseau, Jaucourt, hwd) derket, di riya rizgarkirina zanîn û ramanê ji dogmatîzma dînî û tesîrên feodal, di warê belavkirina bawerîyên zanistî û materyalîst gavekî gelek pêşverû teşkîl dike.*

# SWÊD

Komela Karkerên Kurd li Swêdê telgrafa jê rîn ji serekwezîrê Tirkîyê Bulent Ecevît re şand.

Serekwezîr,
Bulet Ecevît.
Ankara

Tekoşîna ku gelê Kurdê stembar jibo mafên xwe yên mirovî yên ku daxwaza wî ya xwe zayîtir e dide heta îro ji aliyê hikûmetên nijadperest - faşîst dı xweynê de ha tiye perçiqandinê.

Eynî stem di dema hikûmeta ku hun serek wezîrê wê ne de jî tê dom kirin. Mînaka girgîntira vê yekê tehrîk û tetbîqata "Kanatli Jandirma-78" ku dî navçeyên kurdî de, van demên dawîn tên kirin e.

Em van hemî cirm û tahrîkên ku li hemberî mirovahiyê tên kirin bi xurtî mahkûm dikin û daxwaz dikin ku hun ji Peymana Dawînî ya Helsinkî yê ku Tirkiyê jî libinî îmza xwe danîye îhtiram nîşandin.

Stockhlom. 27.9.1978

KOMELA KARKERÊN KURD LI SWÊDÊ

# MIZGÎN

KOMELA KARKERÊN KURD LI SWÊDÊ KOVAREKE BI NAVÊ "ROJA NÛ" DERDIXE. EM JI ROJA NÛ RE JIYANEKE DIRÊJ DAXWAZ DIKIN.

# CIVÎNA AVAKIRINA FEDERASYONA KOMELÊN KARKERÊN KURD.

Komelên Karkerên Kurd li Almanya Federal û Berlîna Rojava dest didin hev û Federasyonek ava dikin.

Karkerên Kurd ên ku li Almanya Federal dixebitin, wek karkerên biyanî (xerîb) ên din pir problemên wan nehatîye helkirin. Karkerên me di jiyana civakî de hatine perçiqandin, piçûk hatine dîtin, çetinayî û tadeyên siyasî, dadî (hikûkî) û sosyal dîtine.

Karkerên Kurd rîya rast dîtin. Ew jî di jî tade û zordestîyê yekbûne, bo stendina mafên xwe têkoşîn kirine. Bo vê yekê karkerên Kurd dijî zilm û zordestîyê dibin yek. Gora hêza xwe li bajarên Almanya Federal û Berlîn'a Rojava de Komelên Karkerên ava kirin. Niha şunde ev komelên karkeran dibin yek û federasyonek saz dikin. Bawerîya me ew e ku kîjan gel, li kîderê dibe, bila bibe karker destbrakê hev in, daxwaz û mafên wan yek e.

Bi vî awayî emêproblemê xwe baş bizanibin. Him jî bo hilkirina wan emê gavên pêt pêşve bavêjin.

-Di civînê de em ser problemên xwedanûstendin çêbikin û xwastin û pêşniyarên xwe berbiçav bînin û ser vê bingehê yekîtîyek ava bikin.

-Hemî karkerên welatparêz û pêşverûyên Kurd di civîna ava kirina Federasyonê de bibin yek.

-Meriv û komelên pêşverûyên Alman û biyanîyên din di avakirina Federasyonê de bêşdar bibin.

DAWÎYA AVAKIRINA FEDERASYONÊ-ROJA ŞEMÎ-ÊVARÊ SAET 19 DA SALONA CIVÎNÊ DE EWÊ ŞEVA AZADÎ BÊ PÊKANÎN.

Navnîşan: Komîta Sazkirina Federasyonê
Postlagerkarte 6Frankfurt/M.1 A 012927

**EWÊ KURDISTAN Bi DESTÊ KARKER Û COTKARAN RIZGAR BİBE!**

# KAMÛRAN BEDİRXAN: ŞÊST SALÊN ŞER Lİ

Nvîskar,hozan,helbistvan,zane û welat parêzê Kurdê navdar,Dr.Kamuran Alî Bedîr Xan,roja 4.12.1978,saet di 16 • 45a de di nexweşxanekê Parisê de mir. Mirovhiz û nefspiçûk heta rôjên xwe yên dawîn,K.A. Bedîr Xan laşê xwe jibo lêgerînên zanistî pêşkêşî Fakulta Tibbiya Parisê kir.Nvîskar û roinamevanê enternasyonalîst Jean Bertolîno,ku wî rind nas dikir,di benda jêrîn de jiyana wî bibîr tîne.

Endamê neteweyekî,xelkekî bûn cad û meremekî xisûsî naxwaze,ne tê de heke ev netewe ji **alîyê** yên din ve tê înkar kirin, **heke** ji vî xelkî re mafê hebûnê tê red kirin,"Karekî dijwar e Kurd bûn",digot carna Mîr Kamran Bedir Xan û ew dizanibû qala çi di ke vî zilamê kinikê nazik,biçavên rengvekirî,ev arîtokratê rohelatî yê ji xanedanekî kevn,tejî nezaketekî şêrîn,ku bi awayekî xwezayî vê nermînîya piçek kevnare lê dilovana ku berê di nav xanezayên pirzmanzan û kubarên Osmanî de di rewacê de bû,bi kar tanî.

Di 21 ê tebaxa 1895 a de li Stembolê bûyî û wekî her du **kekên** xwe Sur**eyya** û Celadet,di evî na kalikê binavûdeng Bedir Xan Begê Cizîra Botan Ja,mezin bûyî, Kamûran navekî **qedirbilind** lê giran mîras distend.Kalikê wî,serwerê navçeya Cizîrê,xwastibû te**vayîya** gelê Kurd di bin derefşa xwe de bicivîne,Kurdistanekî mezin ava ke.Û jivê bûnê, di sala 1847 a da serî hilanîbû li dijî Bab-î Alî'yê.Sultan hemî leşkerên xwe şandibû ser siyarên wî. Mîrê bindestketî şarederî Girîtê kirin,dûre şandin Sûrîyê û milkê mîranîya wî kete ser Imparatorîya Osmanî.Nebîyên wî,hê di zarokatîya xwe ya nazenîn de,xewna ku rojekî bidin ser riya wî, biceribînin Kurdistanekî mezin ava kin,xwedî dikirin.Lêbelê nifûza îslamê wisa bû ku gava di 1912 a da şerên balkanî teqîyan û Sultan li dijî Bûlgaran cîhadê îlan kir.Kamûran,hindê hê bizorê 17 salî,xwe dilxwaz da nvisandin. "Ez bawermend bûm,min bawerî hebû.Li nik dilê min,diviyabû,berî hemî,dîn biparêzin".

Gava sewqîyatê,rastî Arif Beg bû,ku giregirekî "Genc Tirk" a û nasekî bave wî bû,kîjan li Stembolê midde-î umûm bû.Ew li bexçê çayxanekî rûniştî bûn û mijûl dibûn.Arif Beg jê re nêzîkahîya qirkirina Ermenîya,"van bêbextan, van gawirên ku timîamade ne xizmeta frengan bikin",îfşa kir.Dûre,heye ku eslê xortê ku dicadand nefreta xwe veşêre û lê guhdarî dike ji bîr kiribê,biservekir:"Û kîngê me van teresan paqij kir,ewê îcar dora qirkirina Kurdan bê".

Kamûran,wekî mirîyekî reng û rûçik dayî,rabû,xatirê xwe ji merivê bêperwa nexwast û çû."Îcar , ez tê gihîştim ku bratîya musulmanî tenê gotinekî bû,ku ji Tirka tiştekî hêvîkirinê nîn bû û ku ewê bidiviya ku em xwe jibo berxwedan û şer havilkar kin".

# ŞARİSTANA



Prof. Dr. KAMÛRAN
ALÎ BEDIRXAN
(1895-1978)

Di 1919 an de,Sermiyan Wilson
di peymana Versailles'ê de proje-
ya Kurdistanekî serbixwe dide pêş
Lê ev proje ewê tucar ji arşîvan
dernekeve.Mustafa Kemal,ku hê nû
karînê li Tirkîyê xistibû destên
xwe,jibo tedbîr leşkerên xwe dişî
ne çavtirsandin û kambax kirina
Kurdistanê û 700 000 Kurdî şare-
derî dike.

Kamûran xwendina xwe ya hiqûqê
diqedîne û digel her du brayên
xwe jibo doza gelê xwe şer dike.
Kekê wî Sureyya Hoybûn an Komela
Serxwebûna Kurdistan rast dike û
hemî hemî welatparezên ku dixwa-
zin şer bikin têde dicivîne. Hoy-
bûn,belavok û pirtûkokan derdixe
û belav dike û,bi dizî,karê ser-
xwerabûnê dike.Ev serxwerabûn di
1927 a,li dorhêla Çiyayê Agirî di
teqe.Serdarekî navdar,Ihsan Nurî
Paşa serokîya wî dike.Li dijî ser
xwerabûnîyên Kurd,Atatürk balafir
topên giran,zirxdar,hemî çekên ho
vîtîya sanayî seferber dike. Kurd
tên qirkirin.Birayên Bedirxan di-
kevin ser riyên şaredarîyê.Surey-
ya li Misrê cîwar dibe,Celadet li
Sûrîyê û Kamûran dihere Almanyayê
li Fakulta Hiqûqa Leipzig'ê teza
xwe ya doktorayê çê dike.Di sa-
lên 30 de,Kamûran li Beyrûtê evû
qatî dike û pê re jî arîkarî di-
de kovarên bi zmanê Kurdî"Hawar"
"Ronahî" ku Celadet wan **derdi**-
xist.Di vê dewranê de ye ku ew
xwe wekî nvîskar û rojnamevanekî
hêja diyar dike.

Li Tirkîyê,serxwerabûnên din
di xwînê de tên fetisandinê. Lê
rojnamên Celadet û Kamûran di
setan de digerin,dikevin kûrahî-
yên Kurdistanê û di van salên ta
rî de jibo gelê Kurd dibin çirûs
ka hêvîyê.

Di domahîya şerê cîhanê didu-
yan de,Mîr Kamûran rojnama xwe
bixwe "Roja Nû" bi kurdî-fransi-
zî derdixe û di bendên wêrek de
dijekarîya nazîzmê dike,bêwestî-
yan gaziya merivekî peritîyê ku
dixwaze cefayên xelkê xwe bi din
yayê bide naskirin,dide dom ki-
rin.

Piştî şer,ew bawer dike ku e-
wê li Ewrûpayê li Rohelat bikêr-
tir be,ewê li Parîsê xebatekî ku
dikaribe ramana tevane ya navne-
teweyî û hikûmatên dewletên me-
zin li ser pirsa Kurdî hişyar bi
ke,pêk bîne.Di 1947 an de ew tê
Fransayê ,pê re mijûlgeha kurdî
saz dike.Va ye ku ew pirtûkokên
agahdarîyê li ser şerê Kurdan di
nivîse,li ser kîsê xwe dide çap-
kirin.Di 1948 an de, ew dîsa ji
kîsê xwe diçe Dewletên Yekbûyî
yên Amerîkayê(USA ) û memorandu-
mekî li ser rewşa giştî ya Kur-
dan pêşkêşî Sekreterê Giştiyê
Hevdesazîya Neteweyên Yekbûyî
(UNO) dike.

Dîsa di wê demê de,ew dest bi
hînkirina zmanê kurdî dike li
Xwendegeha Zmanên Rohelatî yên
jîndar (Zanîngeha Parîsê) û diza
bi xwendekarên xwe ve peywendî-
yên dilgerm xwedî bike.

Gava ku xebata siyasî jê re
keysê dide ew xwe dide xebata
çandî,ferhengekî kurdî-fransizî,
çend pirtûkên rêzmanê (gramerê),
dinivîse,konferans û mijûlahîya
çê dike,di çapa ewrûpayî de ben-
dan dinivîse,tu keysekî narevîne
jibo qala xelkê xwe bike û rewşa

jibo qala xelkê xwe bike û rewşa wî bide naskirin.

Di 1954 an de, ew Nathalîe d'Ossovetzky, Polonîyeka 20 sal jê piçûktir tîne. Ew 59 salî ye û jibo cara pêşîn li xwe, li bextewarîya xwe difikire. Jina wî, ji xelkekî dûrûdirêj perçiqandî, timî îsyankar derketî, jibo wî ne tenê hevalekê bû, hevkar û alîgireka germa doza kurdî bû.

Ji 1961 a bi şûnda, Mîr giranî ya xwe dide parastina gerilla kirda Mlea Mûstafa Barzanî ku çê tirîn leşkerê Iraqê dişkênand. Ew bala ramana tevane dikşîne ser qirkirin û hovîtîyên ku ordîyên Bexdayê li gundê kurdî dikirin, rojnamevanên rojavayî dişîne nav çeyên rizgarkirî, vedigerê Netewe yên Yekbûyî dengê xelkê xwe di de bihîstin.

Di 1970 a de dixwaze bixwe here Kurdistana aza, tevî jiyana pêşmergan bibe, berî mirinê qenebe carekî şerê din, yê çekan bibîne. Jina wî zor kêfxweş e. Her du rojekî bi dizî, birêdikevin. Barzanî bi qedirgiranîkî mezin wan dihewîne. Ji her alîyên Kurdistana şerkar, serek tên ku lê silavê bikin. Kamûran xwe perûkirî dibihîze.

Li vegera xwe ya Fransayê de ew helbestên destanî, qîrînên dawînên merivekî ku dizane ku ewê evara mezin nebîne, diafirîne. Jina wî jinişkeva di sebata 1975 an de dimire. Gerîlla Barzanî 15 roj bişûnda dipelişe. Di tenahîya xwe ya xemgîn de Mîr Kamûran Bedirxanê Cizîra Botan li hêvîyê ye ku mirin wî rizgar ke. Ewî karê xwe rind kir, karê xwe yê Kurdîtîyê.

**Jean BERTOLINO**

# ZMAN

## Ferhengok

Afirandin: *(t)yaratmak, yapıt; (f)créer, oeuvre*
Azadî: *(t)özgürlük; (f)liberté*
Baneşan: *(t) ünlem; (f)interjection*
Beng: *(t)görüntü; (f)image*
Bersiv: *(t)yanıt, cevap; (f)réponse*
Bêşederî: *(t)gümrük; (f)donane*
Biyanî: *(t)yabancı; (f)étranger*
Bûyer: *(t)olay ; (f)évènement*
Civak: *(t)Toplum; (f)société*
Çand: *(t)kültür; (f)culture*
Derefş: *(t)sancak; (f)étendard*
Destpêkî: *(t)başlangıç; (f)élémentaire*

### Rojên Heftê

Yekşem: *(t) Pazar; (f)Dimanche*
Duşem: *(t)Pazartesi; (f)lundi*
Sêşem: *(t)Sali; (f)Mardi*
Çarşem; *(t)Çarşamba; (f)Mercredi*
Pêncşem: *(t)Perşembe; (f)Jeudi*
În: *(t) Cuma; (f) Vendredi*
Şemî: *(t)Cumartesî; (f)Samedi*

Dirav: *(t)para; (f)monnaie, argent*
Dîrok: *(t)tarih; (f)histoire*
Endam: *(t)üye; (f)membre*
Gelha: *(t)nüfus; (f)population*
Gerdûn: *(t)evren; (f)univers*
Girîng: *(t)önemli; (f)important*
Giştî: *(t)genel; (f)général*
Gotan: *(t)söylev, nutuk; (f)discours*
Hilberandin: *(t)üretmek; (f)produire*
Hilberînî: *(t)üretîm; (f)production*
Hilberî: *(t)ürün; (f)produit*

# Afirandin

*ÇAPBÛYÎ*

*Li derveyî bend, belavok û konferansên bi zmanên cihêreng di kovar û rojnameyan de derketî, Prof. Dr. K.A. Bedir Xan pirtûkên jêrîn derxistîye.*

- *Elfabeya Min, Çapxana Hawarê Şam, 1938, 32 r.*
- *Langue Kurde, Parîs, 1953, 253r.*
- *La question Kurde, Paris, 1959 16 r. (bi fransizî û almanî)*
- *Le Kurde sans peine, Paris, 1965, 172 r.*
- *Der Adler von Kurdistan, Potsdam, 1937.*
- *Destpêka Xwendinê, Paris, 1971 165 r.*
- *La Lyre Kurde; Le Calvaire du Kurdistan (helbestên bi fransizî)*
- *Çarînên Xeyyam*

*AFIRANDINÊN HÊ DERNEKETÎ*

- *Ferhenga Kurdî-Fransizî*
- *Ferhenga Fransizî-Kurdî*
- *Tefsîra Quranê (jê tenê hin sûretçapbûne); Çar Incîl.*

## Dem û Mehên Salê

Di salekî de çar dem hene: Bihar, havîn, payîz û zivistan.

Va ne navên duwanzde mehên salê bi zmanê Kurdî tevî wergerandina wan a tirkî û fransizî.

Çile: *(t) Ocak; (f) Janvier*
Sebat: *(t) Şubat; (f) Fevrier*
Adar: *(t) Mart; (f) Mars*
Nîsan: *(t) Nisan; (f) Avril*
Gulan: *(t) Mayis; (f) Mai*
Hezîran: *(t) Haziran; (f) Juin*
Tîrmeh: *(t) Temmuz; (f) Juillet*
Tebax: *(t) Agustos; (f) Août*
Îlon: *(t) Eylül; (f) Septembre*
Cotmeh: *(t) Ekim; (f) Octobre*
Mijdar: *(t) Kasim; (f) Novembre*
Kanûn: *(t) Aralik; (f) Décembre*

Kaledend: *(t) ham madde; (f) matière première*
Karbidest: *(t) yönetici; (f) diri-*
Karîn: *(t) iktidar (f) pouvoir/geant*
Kêrha: *(t) çikar; (f) intérèt*
Kirêt: *(t) igrenç; (f) minable*
Maf: *(t) hak; (f) droit*
Navgîn: *(t) araç; (f) moyen*
Peywendî: *(t) ilişki; (f) relation, rapport*
Peyweng: *(t) gereç; (f) instrument*
Pêvajo: *(t) süreç; (f) processus*
Pronav: *(t) zamir; (f) pronom*
Rexne: *(t) eleştiri; (f) critique*
Şarederî kirin: *(t) sürgün etmek (f) déporter, exiler*
Şaristan: *(t) gurbet; (f) exil*
Nûçe: *(t) haber; (f) nouvelle*
Mako: *(t) oysa; (f) or*
Nêrevan: *(t) gözlemci (f) observateur*
Rewş: *(t) hal, durum; (f) état*
Teşe: *(t) biçim; (f) forme*
Xweza: *(t) doga; (f) nature*
Xwedanî: *(t) mülkiyet; (f) propriété*
Xweger: *(t) özerk; (f) autonome*
Xwemeş: *(t) otomat; (f) automate*
Veguhêrîn: *(t) dönüşüm; (f) transformation*
Zanistî: *(t) bilim; (f) science*

## Elfabe

Ji salên 1930an bivir de zmanê kurdê bi tîpên (herfên) latînî tê nvîsandin. Elfabeya latînî xweş li zmanê mete û ewê bêgûman bibe ya hemî Kurdan. Lê niha jiber sedemên cihêreng piraniya Kurdên Iran û Iraqê tîpên erebî, yên Sovyetistanê jî tîpên rûsî bikartînin. Jibo agahdariya xwendevanan va ne ev her sê elfabe.

| Latînî | Rûsî | Erebî | Latînî | Rûsî | Erebî |
|---|---|---|---|---|---|
| A | А | ا، ٲ، آ، ع | N | Н | ن |
| B | Б | ب | O | О | ۆ |
| C | Щ | ج | P | П | پ |
| Ç | Ч | چ | Q | Q | ق |
| D | Д | د، ض | R | Р | ر |
| E | Ә | أ، ە، ـَ، ع | S | С | س، ص، ث |
| Ê | Е | ێ، يـ، ى، ع | Ş | Ш | ش |
| F | Ф | ف | T | Т | ت، ط |
| G | Г | گ | U | Ӧ | ـُ، و |
| H | h | ھ، ح | Û | У | و |
| I | Ь | إ، ـِ، ـيـ، ى، ع | V | В | ڤ |
| Î | И | إ، يـ، ى | W | W | و |
| J | Ж | ژ | X | Х | خ، غ |
| K | К | ك | Y | Й | ـي، ى |
| L | Л | ل | Z | З | ز، ذ، ض |
| M | М | م | | | |

**KURDÎ BİXWÎNE, HÎN BİBE, HÎN BİKE!..**

*Hevalên delal ez dixwazim, ji we re bêjim ku:*

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Tirkîye

Berpisîyarê Berêz
Kovara we li nik hevalek gihîşte destê min. Lêhûrnêrînek kûr û bêalî, ji dil dibêjim û dajom pêş ku kovara we gelekî têkûz û li ser rêyekî zanistî dimeşe.

Tika min ev e ku hûn ji min re kovarê bi domî tevî jimarên heta niha derketine li ser navnîşana min bişînin.

Giştî xebatkarên kovarê bi dilgermî pîroz dikim; serketin, weşanek domî, pêşveçûnek zanistî daxwaza min e.

Hevalek we

## Köln

Brayên Hêja û Delal
Kovara we AZADÎ dest girtim û min teva li hevala bela kir. Lê bawer bikinçendek din jî hebûna min dikaribû li hevala bela bikra.

Silava bratîyê. Hêvî darim ku hun xebatekî hêja bikin û rûspîyê welatê xwe bin.

F.G.

## Swêd

Ji sernvîskarîya Kovara Azadî re
Ez benî, du hejmarên cenabê we gihîştîye cîgaha min. Sed spas û sed slavan.

Bi bratî, rastî û dostî ê we.

DR. S. RASTGELDI

## Erivan

Em bi ronayîdîtina kovara AZADÎ zendegirtî mane. Ew pir delal û hêja ye. Em we pîroz dikin û bi wê serbilind in. Me li ser mesela ronahî dîtina AZADÎ bendek nvîsî bi 2 rûpelî û di radyoya Kurdî de da weşandin

Silavên germ bo hemî hevalan

Têmûrê XELÎL

## Swisre

Bi marksîzm- lenînîzmê hunê Milletê Kurd berdine hev û heke xebata we çû serî jî hunê sosyalîzmeke baasî, an Kambocî, an jî Cezayîrî deynin. Wê çi ji wan derkeve? Jibo me reyine din gerek in û divê em li wan bigerin.

Ji lewre ez çêtir dibînim ku şûna "Kovara Marksîsta Kurdî" hun AZADÎ;

-Kovara bratîya Kurdan?

-Kovara bratîyê?

-Kovara yekîtîyê?

an "Kovara Azadîxwazên Kurdî?"

an jî "Kovara Demokratên Kurd" deynin.

N.ZAZA

## Almanya

Hevalên delal û hêja
Min Kovarê 2 an xwend zor baş û delal bûn. Bi gertehê xwe, bi nivîsên xwe û bi zmanê xwe pir delal bûn. Lê rexnê xwe hinekî pir sert bûn. Hêvîdarim em rexnê xwe bi cebarî bikin. Pêwiste ku em dijminatîya hev dû nekin, lew em ji hemû hêlê xwe de bindest in.

Şivan

## Almanya

Ji Kovara Azadî re
Ez derketina we bi dil û can pîroz dikim. Li hemî dost û hevalên ku tevî karê Kovarê dibin silav û serfirazî.

Min heta niha du hejmarên AZADÎ'yê xwendime. Û pê gelek şa bûme. Daxwaza min ew e ku hun ji riya xwe averê nebin, kovara xwe timî derxin.

Dîsa silav
Hevalê we Memo

## Tiflis

Kovara Azadî hejmara 2 a giha destê min. Gellek ji we razî me. Mala we ava.

We rêkî baş daye pêşîya xwe. Rastî, di dema me de rizgariya miletê Kurd û Kurdistanê tenê bi Marksîzm-lenînîzmê dibe. Tenê karker û cotkar dikarin, yekbûnîya wan dikare Kurdistanê ji destê neyara xelaske. Lê wekî xebata wan her du cînan baş pêşda here û qeweta xwe bawer bikin. Lazim e zanistîya Marksîzm-lenînîzmê baş fehm bikin û têkin quba xwe. We barekî giran hildaye ser stîkura xwe. Serfirazîya we dixwazim.


Naka derheqa kovara we. Kovara we kovara marksîstîyêye, erê? Ser belge kovarê gelek tiştên baş in, ji dîroka Kurd û Kurdistanê, li ser şerê hindur û ên mayîn. Ev hemî tişt baş in. Lê ne hun marksîst in û çima derheqa halê karker û cotkarên Kurdistanê, meselên zorkarîya axa û began qet nanivîsin? Bi çi cûreyî hun dixwazin çavên wan vekin û wan ji xewê rakin, bidine pey xwe? Marksîzm herê, serîda wan pirsê wî bidine ber çava, yê ku roja îro miletê me re ferz e. Riya xwe hun dizanin. Eva fikrê min e.

ANKOSÎ KERÎM. NVÎSKAR

Di hêviya bersive we de.

Dilwîn Şerașer

# Cegerxwîn



# STEM DİMRÎ bi hik mê dem

Bese paçik ji guh derxe çi hewar û çi qêrîne
Xwe rapêçe ji bo cengê bi zor heqqê xwe bistîne

Dizi û cirm û bês û zor, bese millet li te şerme!
Dema tang û firoka ye, çi xişt û def û tizbine.

Bixwîne da tu serbest bî, bi xurti bighê doza xwe
Binêr her tişt li dinya yê wekî cenga Filestine

Cîhan bûye du bend îro, ko maldar û belengazın
Di ber hev re şerîpanin ji Çînê ta biçi Çîne

Belengazan serî hildan, sitem îdi qebûl nakin
Ji destê sermeyandaran gelek zor û sitem dîne

Dilovanî digel zorê, her û her ceng û lêdane.
Çiya û deşt û av û bej, ji sertirên sitem xwîne
Cegerxwin tim dikî qêrîn, sitem dimrî bi hikmê dem
Ji min bawer ke ey millet nebê dîne ne bê dîne.

# Deng û Alan

## Çapa Kurdî

**LE MONDE DIPLOMATIQUE,**

Rojnama navneteweyîya navdara fransiz di hejmara xwe ya cotmehê de bendekî li ser şerê gelê Kurd û pirtûka "Les Kurdes et Le Kurdistan" derxist.

**BASLER MAGAZIN,**

Rojnama swîsî ya bizmanê almanî,di hejmara xwe ya 2.12.1978 a de bendekî Jürgen Roth li ser rewşa Kurdistanê çap kir.

**ŞEVA** 22.11?1978 li Cenevreyê (Swîsre) civînekî li ser "Mafên hindikahî û gelên bindest" çêbû.Tê de nemînendekî Kurda jî peyivî.Rojnameya swîsî "La Tribune de Genève" a 23.11.1978 cihekî berbiçav da vê civînê.

**AN-NAHAR,**

Rojnama erebî ya ku li Parîsê dertê,di hejmara xwe ya 4.12.1978 a de bendekî dirêj di bin navê "Amerîka çawa Kurda bi kar anî" çapkir.Emê vê bendê di hejmarekî wêbeyê de bi Kurdî derînin.

Di destpêka kanûnê de li bajarê fransiz Macon'ê liser Kurda civînekî çandî û raberîyeke wênan çêbû.Rojnameyên cigehî Le Courrier de Saone et Loire(7.12.1978) Progrès de Lyon (9.12.1978) cihekî berbiçav dan vê bûyerê.

**LELİO BASO,**

Mîlîtanê enternasyonalîstê Italî,serekê dadîgeha Russel 2,sazkerê Komela ji bo Parastina Mafên Gelan di destpêka kanûnê de li Romayê mir.BASO dostekî hêjayê gelê Kurd bû û jibo pirsa Kurdî li Italyayê xebatekî hêja dikir.

**RADIO TİFLİS,**

Li Gurcîstana Sovyetîyê di 29 ê îlonê de dest bi weşînekên bi zmanê Kurdî kir. Weşînek ji heftê carekî roja înê ji saet 18:20 heta 18:30 li ser pêlên Kurt 4,31 m û pêlên navî 288m tên weşandinê.

## pirtûken nû

Problems of the History of the Kurds of the Near East 10th-20th centuries(bi zmanê Gurcî) A. M. Menteşaşvili,Tbilissi,1978;290 r.

Kurdische Märchen (Çîrokên Kurdî) Eugen Diederichs Verlag,Düsseldorf-Köln 1978,288 r.

Bi zmanê Kurdî û tîpên latînî bilî Azadî yê tu kovar dernakevin. Va ne navên yên ku bi tîpên din dertên.

- Riya Teze,ji sala 1930 a bivirde li Erîvanê di heftê da du car derdikeve.4 rûpel û Organa PK a Ermenîstanê ye.
- Kurdistan,organa PDK a Iranê ji mehê carekî bi tîpên erebî dertê.4 r. (çapa farisî jî dertê).
- Bîra Nûw,organa Partîya Kommunîsta Iraqê, bi tîpên erebî dertê.

### Kovarên ku bi du zmana dertên

- Rizgarî,bi kurdî-tirkî li Tirkîyê dertê.Hejmara pêşîn di adara 1976 a de derketîye.Heta niha 6 hejmar çap bûne. Her hejmarekî 130-140 rûpel e.
- Roja Welat,bi Kurdî-Tirkî li Tirkîyê dertê.Heta niha 10 hejmar çap bûne. Her hejmarekî 16 rûpel e.
- Kovara Özgürlük Yolu (Riya Azadî) ku hin bîrewerên Kurd ji hezîrana 1975 bivirde ji mehê carekî derdixin,carna bi kurdî bendan li ser zman û wêjejê (edebîyatê) çap dike.
- DevrimciDemokratık GençlikDergisi,bi tirkî-kurdî,li Tirkîyê dertê.Heta niha çar hejmar çap bûne.
- Roja Nû,bi kurdî-tirkî li Swêdê dertê Organa Komela Karkerên Kurd li Swêdê ye û 4 rûpel e.

# * Stran û Leylan * *

AZADÎ, jibo qenc nasîna mûzîkiya·kurdî sêlik (plak) û kasetên biqalîte bidest dixe, dadigre û difroşe. Ji niha ve hun dikarin yên li jêrê binav kirî ji me bixwazin. Her kasetekî 60 deqîqe dom dike û bi 5 Dollar (10 DM), Sêlika 33 ger bi 7 Dollar (14 DM) e.

azadî

ARAM

Stran û leylanên KURDÎ

Kurdish Songs & Melodies


## Sêlik

Musique populaire du KURDISTAN. Chants d'Amour (Kulamên dilan).

## Kaset

1. Meqamên kevn bi Orkestra nûjen.
   *Lêdixe Orkestra Geleri ya KURDÎSTANÊ.*
2. Kulamên Dilan -1-
3. Kulamên Dilan -1-
4. Kulamên Siyaran
5. Bilûr, Fîq (Dûdûk) û Piyano.
6. Def, Zirne û Fîq
7. *BEYT, QESÎDE, HELBEST*
8. *A R A M*
9. Kulamên Kurmancî û Soranî (bê musikî).
10. Kulamên govendê (bê musikî).

# GİLİYÊN ÇEPRAZÎ



## kêlekî

1. Kesê ku ji welatê xwe hiz dike 2. Rewşa yê ku jin ne anîve; dîn; pronavekî. 3. Xezîne, maden; maç; nîvê aqar. 4. Yê rojê; ne a kedî. 5. Zû di enire; baneşanekî. 6. Nîvê bavo; brayê mêr; heta niha. 7. Mehekî; bê wê jiyan nabe; merhale. 8. Şêr e ku te dest avet dibe rûvî; ufuq; parî veke pê lêker (fîîl) çê dibin. 9. Dîroknvîsekî kurdî hemdem. 10. Bêrûn; didin ser stûyê ga û yên bin destan. 11. Hate dinê; dewsa xwedîmal digire û karê wî digerîne; çika. 12. Di berîka yên ku ji xwe hiz dikin de timî heye; dîroknvîs û zanevekî kurdî navdar.

## berejêrî

1. Cihêbûn û îmtîyazên hebûnê nax waze. 2. Mêvîka ezo; bi soranî ji zaro re dibêjin; kî jê be serî wî spî ye. 3. Şoreşgerekî binavûdeng; ne lihêf e lê meriv di sermayê de li xwe dinêçe. 4. Mam; nûçeyên rojê dinivîse. 5. Çavê wî li vexarine ye; parîveke piçûkkirinê; zirav e û genc dibire. 6. Darekî; êşek e meriv havînê pê dikeve; not 7. Qûtê Kurdên çiyayî; kurtiya agir. 8. Navê şoreşgereka navdar; hevalê cefakarê şivana; mana nevînê dide. 9. Zaro xwe tê de dihejînin: parîyeke piçûkkirinê: bexşandin. 10. rojekî heftê. 11. Ronkahîya şevê; ev car. 12. Hozan û helbestvanekî kurdî şoreşger.

# * Stran û Leylan * *

Allegro

MAMO

CEMÎLA CELÎL




Mamir, Mamir, Mamir, lo, Mamo,
Mamir, Mamir, Mamir, pizmamo.

Ava ji ç'îyê tê, lo, Mamo,
Ava ji ç'îyê tê, kuřmalo,

Nav gul û nêrgiza tê, lo, Mamo,
Nav gul û nêrgiza tê, pizmamo,

Bîna yara jê tê, lo, Mamo,
Bîna yara jê tê, kuřmalo.

# Lenîn dibêje

ÇAWA MIROVAHÎ NIKARE BIGIHÊ WINDABÛNA SINIFAN(ÇÎNAN) BÊY GEHÎNEKA DERBASÎ YA DÎKTATORIYA SINIFA BINDEST, WISA JÎ EW NIKARE BIGIHÊ TEVHEVÎYA NAYEREVÎNA(MIQEDERA) NETEWEYAN TA KU EW DEMA DERBASOKA RIZGARIYA TEMAMÎ YA HEMÎ NETEWEYÊN BINDEST NEJÎ, TA KU NETEWEYÊN BINDEST AZADIYA XWE YA CIHÊ-BÛN Û VEQETANDINÊ BIDEST NEXIN.

Oeuvres *(Afirandin)*, 22, p.159

**azadî**
KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ

Jibo nêzîkbûyina hêz, bêşok û komikên şoreşger û welatparêzên Kurdîstanê dixebite.

Bi arîkariya komekî Xebatkar û Xwendakarên Kurd derdikeve. Bi tu partî û hevdesaziyên tu perçeyekî Kurdîstanê ve negirêdayî ye.

Berpirsiyarê giştî : K E N D A L
Nvîsekarî : E V D O
Berpirsiyarê malhetûnê: H.KARACA
Foto-Maket : J.BERTOLINO
Çap : Îsmet-Misto-Raûf

*NAVNÎŞAN (adres)*: K O V A R A A Z A D Î
B.P.378 75625 PARIS CEDEX 13 France

● DIRAV *(pere)* li ser navnîşana A Z A D Î
CCP n° 23 37 449 L Parîs/ France

**KURDİSTANA AZA, YEKBÛYÎ, SOSYALÎST !**